

## 17ê Nîsanê, Cejna Niştimanî ya welatê me Sûriyê

Rêberê Silîvî

Sala 1920an, piştî lihevhatina Sykes-picot, welatê me Sûriya îro kete bin mandatkirina Firensayê û sala 1923an, leşkerê dagîrker bi serokatiya fermanî frensî yê navdar Rogan gihişte devera Cizîrê.

Gelê me yê Kurd jî li hemî deverên xwe yên dîrokî, mîna birayên xwe yên Sûrî ji ol û nijadên dîtir, tîrş û taliya zordestiya dagîrkeran tam kiriye, ji bo berdan û derkirina wan ji xaka welêt xebat kiriye û qurbanîyên giran û buha daye.

Gelê me çi li Cizîrê, Kobanê yan Çiyayê Kurmênc, li dij Firensa serî hildaye. Dema ku, cara pêşîn ew derbasî Şamê bûye, Yûsif Al-Ezme yê Kurd digel têkoşerên Ereban, di şerekî ne humkuf de, ji bo parastina xaka welêt, xwîna xwe ya buha rijandîye û bi mîrxasî yekîtiya netewî li ser xaka welêt nîgar kiriye. Di şoreş û serhildanên rizgariyê de, gelê me berevanî di ber welatê xwe de li deverên Kurdî û li Şamê jî kiriye. Lê mixabin, îro karbidestên dewletê bi çavên gumanê li welatparêziya gelê me temaşe dikin, siyasetên nijadperest derheqa hebûna wî, ziman, çand û folklorê wî bikartînin, pîlanên birçîkirin û lawazkirina wî bi rêve dibin û li hember pêşketina wî ya xwezayî keleman diçînin. Wan, hemî cangorî, xebat û kêferata gelê me yê Kurd a ji bo avakirina welatekî xweser û bi rûmet, ku hemû

pêkhateyên wî azad, serbest, û bi rûmet bijîn, ji bîr kirine û ew dane ber şek û pekan!! Ev gunehkariya mezin a îro li gelê me dibe, yekîtiya niştimanî dipelêxe, dihêle ku kesê Kurd nema bi girêdana xwe bi welatê xwe ve hestewer û serbilind be. Ev yeka ha bûye birîneke kûr û di laşê welêt de cî girtiye. Bêgumane rojekê ewê ji ber ve bêne darizandin.

Di vê bîranîna pîroz de û mîna nimûneyeke balkêş ji beşdariya gelê me di berxwedan û serhildanên dij dagîrkrên firensî de, ez vê parçeya bijarte ji pirtûka mamosta **Samî yê Mele Ehmedê Namî** pêşkêşî xwendevanên NEWROZê dikim.

Di pirtûka xwe ya bi navnîşana "**Dîmenin ji dîroka wînda**" de, Mamoste Samiyê Mele Ehmedê Namî, destnivîseke bavê xwe, nivîskar û helbestvanê bi nav û deng ê gorbuhuşt Mele Ehmedê Namî parastîye, Seydayê M.E.Namî, wiha gotiye:

*" Di roja 28.06.1925an de, çekdarên Haco- ku nêzikî hezar çekdarî bûn- kozik û çeperên xwe li dormedorê Beyandûrê danîn, nemaze li bakurê gund, li pişt axa xeta hesinî a tirênê. Bi berbanga sibehê re, agirê şerekî dijwar pêket û wê rojê ta êvarî ji her çar aliyan ve, agir li qerargeha serê gir hat barandin.*

*Sercanê firensî Liyandirî bi hûravêja xwe digel 80 leşkerên firensî ve* **D.R (11)**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***